

Hûn bi xêr hatin pirtûkxaneya bajarê Bochumê

Pirtûkxaneya bajarê Bochumê çi pêşkeş dike?

Pirtûkxaneya bajarê Bochumê bi tevahî ji bo welatîyên xwe îmkân û derfetan dide ji bo sûdwergerîna ji numûneyên medyayê, agahiyan û perwerdeyê.

Di pirtûkxaneya navendî de û her wuha di şeş heb şaxên din ên pirtûkxaneyên taxên din ên bajarê de hevkarên pişpor hene, ên ku wê ji we re bibin alîkar, heke hûn li berhemên medyayê û agahiyan bigerin.

Qasî 400.000 numûne ji medyayê li benda we ne, ku hûn karin bi xêra wan jiyana xwe a rojane eyar bikin û pê wexta xwe a valayî derbas bikin, - ewna ji bo fêrbûnê û ji bo wextderbaskirinê ji we re amade ne.

Di nav pirtûkxaneyê de hûnê van berheman bibînin:

- Roman, pirtûkên ji bo zarokan û ciwanan
- Pirtûkên di derbarê tiştan de û kitêbên şîretdayînê
- Pirtûkên bi deng, film û albûmên mûzîkê
- Kovar û rojname
- eBooks, eAudio, ePaper
- ... û her wekî din.
- Lîstik
- Qursên zimên
- Romanên bi zimanên biyanî
û pirtûkên zarokan ên bi zimanên biyanî

Van berheman hûn karin kirê bikin. Bê guman hûn karin van berheman di nav pirtûkxaneyên me de bixwînin, pê bixebitin, pê hîn bibin an hûn karin wana ji bo lêkolînê jî bi kar bînin.

Bikaranîna van numûneyên medyayê di nava pirtûkxaneyê de belaş e û bêyî ku mirov xwedî nasnameyekî be, ev yeka pêkan/mumkun e. Heke hûn bixwazin tiştêkî kirê bikin, divê hûn qeyîda xwe çê bikin û bixwazin ku ji we re nasnameyê bikaranînê were çêkirin.

Bi çi awayî dikarim bibim xwedî nasnameyekî bikaranînê?

Heke hûn ji bo xwe an jî ji bo zarokê xwe qeyîda xwe dixwazin çêkin, hingê nasnameya we an jî pasaporta we bi tev kaxizeke qeyîda/iqameta we digel sazîya iqametkirinê lazim in.

Kesên wek penaber, ji wan re kaxiza ji bo qeyîdkirina wek penaberekî (BÜMA) an jî destûra iqametê bi tev kaxiza qeyîdkirinê lazim in.

Buhayê nasnameya bikaranînê çi qas e?

- Ji bo zarokên ku salên wan di binê 18 de ne, ev nasname belaş e
- Ji bo mirovên mezin nasnameyê ji bo saleke 30 € ye (bi erzanî 10 €), ji bo nasnameyekî nîvsalî ev pere 18 € ne (bi erzanî 6 €).

Bi kerema xwe bipirsin: ka kîjan awayê nasnameyê ji bo we erzantir e. Ji bo hûn karibin bi awayekî erzanî nasname bi dest bixin, divê vê yekê îspat bikin.

Ez çawa karim numûneyên medyayê kirê bikim?

Berhemên medyayî, ên ku hûn dixwazin kirê bikin, hûn karin xwe bi xwe li termînaleke/cihekî ji bo kirêkirinê qeyîd bikin. Bi kerema xwe kaxizeke ji bo muhletê/demê ji xwe re çap bikin, ku li ser wê navê medyaya kirêkirî û her wuha roja paşvedayînê hatine nivîsandin.

Heta kingê ez karim numûneyên berheman li cem xwe bihêlim?

- Dema kirêkirinê ji bo pirtûk, pirtûkên bi deng, film, albûmên ji bo zarokan, pirtûkên ji bo notên mûzîkê, pirtûkên lîstik û qursên zimên 28 roj in.
- Dema kirêkirinê ji bo albûmên mûzîkê, kovar û medyayên din ên elektronîk 14 roj in.

Hûn karin dema kirêkirinê heta du caran bidin dirêjkerin, - ji bo vê yekê divê hûn an bi awayekî şexsî bîn pirtûkxaneyê, an bi rêya telefonê an jî li ser înternetê.

Bi kerema xwe bala xwe bidinê: Dema kirêkirinê wan numûniyên medyayê, heke mûşteriyekî din ewna rezerve kiribe, nikare were dirêjkerin.

Wê çi bibe, heke berhem bi derengî paş ve bêñ dayin?

Heke hûn wan numûniyên medyayê bi awayekî dereng teslîm bikin an jî dema kirêkirinê bi derengî bidin dirêjkin, divê hingê hûn xerçeke bidin.

Ji bo her berhemî buha wuha ye:

- Ji roja 1ê pê de: 1,50 €
- Ji roja 8ê pê de: 3,00 €
- Ji roja 15ê pê de: 6,00 €
- Ji roja 22ê pê de: 10,00 €
- Ji roja 29ê pê de: 15,00 €
- Ji roja 36ê pê de: 20,00 €

Bi kerema xwe servîsa me a belaş bikarbînin, a ku bi rêya E-Maîl wê ji we re roja xelasbûna dema kirêkirina a wan berhemên kirêkirî bîne bîra we.

Wê çi bibe, heke berhemên kirêkirî bêñ wunde kirin an jî zirarek li wan were kirin?

Ji bo wan numûneyên berhemên we kirê kirine û her wuha heke zirar/zianek li wan were kirin divê hûn mesûldar/berpirsiyar in, hûn curmê wê bikşînin.

Heke nasnameya we a bikaranîna wunda bû! Hingê hûn çi bikin?

Bi kerema xwe bi zû xeber bidin pirtûkxaneyê û ji ber rewşa ewlekariyê bikaranîna nasnameya xwe bidin qutkin. Ew tevdira qutkirinê dikare ji holê were rakirin, heke nasnameya bikaranîna dîsa derkeve holê. Ji bo vê yekê divê hûn kaxizên xwe ên nasnameyî bi xwe re bînin.

Heke hûn 7,5 € bidin em karin nasnameyê li şûna ê kevn çêbikin. Ji bo vî îşî jî kaxizên we ên nasnameyî ji me re lazim in.

Û wekî din?

Di hemû pirtûkxaneyan de, heke hûn nasnameya xwe a bikaranîna nîşan bidin, hûn bi belaşî dikarin têkevin înternetê.

Em navgînên agahdariyan ên li jêr in ji we re pêşkeş dikin:

- **Digibib:** Katalogê pirtûkxaneyan û databankên wêjeyî ên ji tevahiya cihanê
- **Munzinger Online:** Agahdariyên ewlehî di derbarê kesan, welatan, fîlman û mûzîkê de.

Di bin navnîşana www.onleiheruhr.de de hûn karin bi awayekî belaşî/bêpereyî eBooks, pirtûkên bi deng û rojnameyan ji înternetê daxînin û ji bo demeke sinorkirî ji wana sûtê werbigirin.

Di katalogê di bin navnîşana <https://stadtbuecherei.bochum.de> de hûn karin li berhemên medyayê di katalogên pirtûkxaneyê de bigerin, li numûneyên medyayê ên kirêkirî ên ji pirtûkxaneyan navendî mezêbikin, wana ji xwe re eyar bikin, li hesabê xwe ê medyayê binihêrin û hûn karin xwe bi xwe dema kirêkirinê wan heta du caran dirêj bikin.

Digel me bi awayekî rêkûpêk saetên xwendinê ji bo zarokan hene:

- Li pirtûkxaneyan navendî, her rojasêşemiyê, seat 16.30
- Li pirtûkxaneyan Gerthe, her rojapênçşemiyê, seat 15.30
- Li pirtûkxaneyan Langendreer, her rojadûşemiyê, seat 16.30
- Li pirtûkxaneyan Lînden, her rojadûşemiyê, seat 16.30
- Li pirtûkxaneyan Querenburg, her rojasêşemiyê, seat 16.30
- Li pirtûkxaneyan Wattenscheîd, her rojapênçşemiyê, seat 16.30

Bi awayekî rêk û pêkî em ji bo serlêdanvanên xwe tûrên/gerên nasandinê pêşkeş dikin. Em bi xêr hatina we jidil û can dikin!

Civîn û çalakîyên û randevûyên aktuel hûn karin li vira bibînin: <http://www.bochum.de/stadtbuecherei/aktuelles>

Hûn karin me bibînin li ser Facebookê: <https://www.facebook.com/Stadtbuecherei.Bochum/>

Heke pirsên we ên din hebin, hevkarên pirtûkxaneyên bajêr amade ne, ku bersîvên we bidin.

Navnîşan û demên vekirinê

Pirtûkxaneyan navendî

Gustav-Heinemann-Platz 2-6, 44777 Bochum
Tel. 02 34 / 9 10 24 96
Mo - Fr 10 - 19 Uhr, Sa 10 - 13 Uhr

Pirtûkxaneyan Gerthe

Heinrichstr. 4, 44805 Bochum
Tel. 02 34 / 8 58 66
Mo, Di, Do, Fr 11 - 18 Uhr

Pirtûkxaneyan Langendreer

Unterstr. 71, 44892 Bochum
Tel. 02 34 / 8 93 79 39
Mo, Di, Do, Fr 11 - 18 Uhr

Pirtûkxaneyan Linden

Hattinger Str. 804-806, 44879 Bochum
Tel. 02 34 / 9 40 96 84
Mo, Di, Do, Fr 11 - 18 Uhr

Pirtûkxaneyan Querenburgê a li Uni-Center

Querenburger Höhe 270, 44801 Bochum
Tel. 02 34 / 9 10 91 41 / 42
Mo, Di, Do, Fr 11 - 18 Uhr

Pirtûkxaneyan Wattenscheîd a li Gertrudis-Center

Alter Markt 1, 44866 Bochum
Tel. 02 34 / 9 10 65 28 / 29
Mo, Di, Do, Fr 11 - 18 Uhr

Pirtûkxaneyan malbatî a Wiemelhausen

Markstr. 292, 44801 Bochum
Tel. 02 34 / 7 54 01
Mo, Di, Do, Fr 11 - 18 Uhr